KURTEÇÎROK

GIRJBÛN

Elî Xelîl

Di bin sîbera dareka kêm ta, hindek cil û bergên reng tarî yê li ber, ji sirûştiyê têr e, yê ture ye, pê wî yê çepê bi xwe xişandinê pehniyek li gozeka pê rastê da, bêhna jêkvebûnê xwe li difnê da, serçav jêk silbûn, destê wî yê mêkarê xwe kir bi hêzeka xav kulmek li rûyê nêr da, paşve çû, zivirî qidqidik givaşt, difin bû fîteka ji karkeftî , destê nêr nema rawestiya, di hewarê hat serê zendekê veçirand, berda, çû di berîka çepê de, bê alîkarî çeqûk beş kir, sê li memkê rastê dan, xwîn weku kaniyeka ji nû dipeqî fizka wê dewrûber sor kirin, paşê weku zimzimê tena çû, eniya wî ma bê kirên her biryek bû xwe çû.

Destê rastê jî tûre bû, guhê çepê ji quqlikê anî der, gotinên çend salan, yên baş û xirab guh lê bûyîn hemû jê rêtin, alham ya berdewam, êk ji yê dî zûtir, çavê yê dî bi quqilîne. Çeqûk li mejî de, di nav wan hizir û bîrên hatîne rêtin da, bi tenê ew li ser şaşa sînema aşûpa serê diryayî hate nîşandan, ya bi dirêje şeva ew leşe di nav pêçêçûlkê de bi çavdan hatiye xwedankirin, devî ji pêş hemûyan ve axînk dira hêlan.

Germa rojê ya xwe di nav xwînê ve didît divê wê jî hişk bike. Her destek yê bi pirtên êk du ve mijûliye, çi bi bera çi bi her tiştekê dî goşt dibirin û hestiyan ji weku dara diqirînin, hêz tê nema.

Êdî çi deng neman ji bilî bivîna mêşa, ba jî tirane bi çilî dikirin, car car dengê hindek tiblan, di nav orkîde rîvîk diqetandin, dengê liçliça pirteka mezin ya kelexî bû paşayê guha, dilekê ter xwe havête der, bi lîtka xwe gehande wan qaqûçka, di binax û çilî ve diveşartin, car jî li xwe dizivirî neke êk bihête, dê şerm ji xwe bike ku eve ya bi serî hatî…